Biryara mijarê 2021-006-IG-UA

Kurteya mijarê

Lijneya Çavdêriyê biryara sereke ya Facebookê betal kiriye ku nivîseke Instagramê pak kiriye ku gel han dida ser tecrîda Abdullah Ocalan, endamekî damezirîner ê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) nîqaşê bikin. Piştî ku bikarhêner itiraz kir û Lijneyê mijar bo venêrînê hilbijart, Facebook gihîşt vê encamê ku naveroka wê bi şaşî pak bûye û ew vegerand. Lijne negîran e ku Facebookê awarteyeke siyaseta navxweyî bi qasî sê salan bi awayê nebaş cîbicî kiriye û ev bûye sebeb ku gelek nivîs bi şaşî werin pakkirin.

Ser mijarê

Ev mijar têkildarî Abdullah Ocalan, endamekî damezirîner ê PKKê, ye. Vê komê bo gihîştina armanca xwe ya damezirandina dewleteke serbixwe ya kurd tundî bi kar aniye. Li gor siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar a Facebookê, PKK û Abdullah Ocalan her du wekî metirsîdar diyar bûne.

Li roja 25 Çileyê 2021, bikarhênerekî Instagramê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wêneyekî Ocalan weşand ku peyvên inglîsî yên bi wateya “hûn gişt bo vê gotûbêjê amade bin” tê de hebûn. Bikarhênerî di nivîsekê de got dema wê ye ser bidawîanîna tecrîda Ocalan li zîndana girava Imraliyê li Tirkiyeyê biaxivin. Bikarhênerî xwendevan han dan bikevin gotûbêja ser zîndanîbûna Ocalan û rewşa nemirovane ya tecrîdê.

Piştî ku birêvebirekî nivîs nirxand li roja 12 Kanûnê li gor rêzikên Facebookê ser Kes û Saziyên Metirsîdar wekî vexwendina bo karê bo piştevaniya Ocalan û PKKê ew pak kir. Wexta bikarhênerî itiraz kir, jê re gotin em nikarin li itirazê binêrin ji ber ku şiyana venêrîna Facebookê bo KOVÎD-19ê bi awayê demkî kêm bûye. Lê, birêvebirekî duyem naverok venêrî û têgihîşt ku wê heman siyaset binpê kiriye. Piştre bikarhênerî li Lijneya Çavdêriyê itiraz kir.

Piştî ku Lijneyê ev mijar hilbijart û ew bo panelê terxan kir, Facebook têgihîşt ku beşeke rênîşana navxweyî ser siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar bo pergaleke nû ya venêrînê li sala

2018an “bi awayekî neqestî nehatiye veguhestin”. Ev rênîşan, ku di sala 2017an de û heya astekê wekî bersiv bo negîraniya ser mercên zîndanîbûna Ocalan hat çêkirin, imkan dide ser mercên tecrîda kesên wekî metirsîdar diyarbûyî nîqaş bikin.

Facebookê jî, hevrê digel vê rênîşanê, li roja 23 Nîsanê ew naverok vegerand Instagramê. Facebookê ji Lijneyê re got niha ser birojkirina siyasetên xwe kar dike ku rê bide bikarhîneran ser mafên mirov ên kesên wekî metirsîdar diyarbûyî nîqaş bikin. Şîrketê ji Lijneyê daxwaz kir ser çawan baştirkirina van siyasetan nêrîn û rênîşanan amade bike. Hevdem ku Facebookê Standardên xwe yên Civakê ser Kes û Saziyên Metirsdar li roja 23 Hezîrana 2021 biroj dikir, van guhertinan bi awayê rasterast ser rênîşana ku şîrketê ji Lijneyê daxwaz kir bandor danenîn.

Peydakirinên kilîdî

Lijneyê fêm kir ku biryara sereke ya Facebookê bo pakkirina naverokê hevrê digel Standardên Civakê yên şîrketê nebû. Ji ber ku rênîşana navxweyî ya ku bi awayê nebaş cîbicî bûbû dibêje bikarhîner dikarin ser mercên tecrîda kesên ku wekî metirsîdar diyar bûne dikarin nîqaş bikin, li gor rêzikên Facebookê destûra wê nivîsê hat dayîn.

Lijne negîran e ku Facebookê rênîşana xwe ya taybet ser awarteya girîng ya siyasetê bi qasî sê salan ji dest daye. Siyaseta Facebookê ya qisûrkirinê bo pakkirina naveroka ku nîşana “piştevaniya” ji kesên diyarbûyî ye, hevdem ku awarteyên kilîdî ji raya giştî re veşartî xwedî kiriye, rê daye ev şaşiya heya demekê neyê dîtin. Facebookê tenê ji ber ew bikarhînerl ku li bal Lijneyê dijî biryara şîrketê itiraz kir zanî ev siyaset nedihat bikaranîn.

Hevdem ku Facebookê ji Lijneyê re got venêrînekê dike çawan nikariye vê rênîşanê bo pergala xwe ya nû veguheze, herwiha anî ziman ku “ji hêla teknîkî ve nabe mirov diyar bike çend naverok di dema ku ev rênîşan ji venêrîneran re berdest nebûye hatine pak kirin.” Lijne bi bawer e ku mimkin e şaşiya Facebookê bûbe sebeb gelek postên din bi şaşî hatibin pakkirin û rapora zelalkirinê ya Facebookê têr nake ku binirxîne gelo ev cure şaş pirsgirêkeke pergalî nîşan dide yan na. Karê Facebookê di vê mijarê de nîşan dide şîrketê nikariye bo çareserkirinê ji mafên mirov re rêzê bigire, Siyaseta Mafên Mirov ya Şîrketê (Beşa 3) binpê kiriye.

Hetanî bêyî eşkerebûna rênîşana ku bi awayê nebaş cîbicî bûye, diviya naverok qet nehatiba pakkirin. Bikarhînerî di nivîsa xwe de alîgiriya tundiyê nekiriye û piştevaniya bîrdoza Ocalan yan PKKê nekiriye. Li şûnê, wan hewl dane negîraniyên mafên mirov ser tecrîda dirêjbûyî ya Ocalan ku dezgehên navneteweyî jî qala wê kirine bînin ber çav. Ji ber ku gelekî dûr bû ew nivîs bibe sebeba ziyanê, pakkirina wê pêwîst û li gor standardên navneteweyî yên mafên mirov guncaw nebû.

Biryara Lijneya Çavdêriyê

Lijneya Çavdêriyê biryara sereke ya Facebookê bo pakkirinê betal kir. Lijne bi bîr tîne ku Facebookê naverok berê vegerandiye.

Lijneyê di daxuyaniyeke rawêjkarî ya siyasetê de li Facebookê tewsiye kir:

- Rênîşana bi awayê nebaş cîbicîbûyî ya 2017an bo Standardên Pêkanîna Navxweyî û Pirsên Naskirî (rênîşana navxweyî bo birêvebirên naverokê) demildest vegerîne.

- Bo pêkanîna siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar pêvajoyên birêvebiriya xwebixwe binirxîne. Her kingê ku pêwîst be, divê Facebook destebendîkaran biroj bike da ku daneyên hînkariyê ji şaşiyên pêkanînê yên berê derxîne ku encama qisûrên bikaranîna rênîşana 2017an in.

- Encamên pêvajoya venêrîna niha biweşîne ku diyar bike gelo tu siyasetên din ji dest çûne yan na, jê wesifên hemû siyasetên jidestçûyî, serdema ji dest çûne, û gavên bo vegerandina wan hatine avêtin.

- Piştrast be “eqlaniyeta siyaseta” Kes û Saziyên Metirsîdar nîşan dide ku rêzgirtina mafên mirov û azadiya gotinê dikare nirxê “Ewlebûnê” bi pêş bixe. Eqlaniyeta Siyasetê gerek bi hûrgilî “ziyanên dinyaya-rastîn” ku ev siyaset li dû ye pêşiyê bigire û û wexta “Deng” ji hedê derbas bû qut bike, diyar bike.

- Şiroveyeke zelal ji tiştê ku “piştevanî” nîne li siyasetê zêde bike. Bikarhîner gerek azad bin ser binpêkirinên idiayî yên mafên mirov ên endamên saziyên diyarbûyî nîqaş bikin.

- Di Standardên Civakê de şirove bike çawan bikarhîner dikarin li pişt nivîsên xwe mebesta xwe ji Facebookê re zelal bikin.

- Ji tevlêbûna watedar a pardaran ser guherînên pêşniyarî li siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar bi rêya Foruma Siyaseta Berhemê ya Facebookê, jê bi rêya vexwenina giştî bo danînan, piştrast be.

- Piştrast be rênîşan û hînkariya navxweyî bo birêvebiran ser her guherîna pêşniyarî ya siyasetê amade bibe.

- Piştrast be wexta naverok tê pakkirin bikarhîner tên agahdarkirin. Haydarî divê bi bîr bîne gelo pakkirin ji ber daxwaza dewletekê ye bûye yan ji ber binpêkirina Standardên Civakê, yan ji ber idiaya dewletekê bo vêya ku qanûna neteweyî hatiye binpêkirin (û şiyana dadwerî bo her pakkirinê).

- Ji bikarhînerê Instagramê re zelal bike Standardên Civakê yên Facebookê bi heman şêweyê ku ji Facebookê re bi kar tên bo Instagramê jî bi kar tên.

- Di raporkirina xwe ya zelalbûnê de ser hejmara daxwazên wergirtî bo pakkirina naverokê ji dewletan ser bingeha binpêkirinên Standardên Civakê (wekî dijî binpêkirinên qanûna neteweyî be), û encamên wan daxwazan zanyariyan jî bixe nav.

- Di raporkirina xwe ya zelalbûnê de ser qasên şaşiyan bo pêkanîna rêzikên ser “pesndan” û “piştevaniya” ji kes û saziyên metirsîdar, ku bi dever û ziman xera bûbin, zanayariyên giştalîtir bixe nav.

Biyraya giştî ya mijarê

1. Kurteya biryarê

Lijneya Çavdêriyê biryara sereke ya Facebookê bo pakkirina nivîsa handana gel bo nîqaşkirina ser tecrîda Abdullah Ocalan, kesê ku Facebookê wekî kesê metirsîdar diyar kiriye, betal kir. Piştî ku bikarhînerî itiraz kir û Lijneyê mijar bo venêrînê hilbijart, Facebook gihîşt vê encamê ku naverok bi şaşî hatiye pakkirin û nivîs vegerand ser Instagramê.

Facebookê şirove kir ku di sala 2018an de "bêyî ku bizane nikariye" beşek ji rênîşana siyaseta navxweyî veguheze pergaleke nû ku rê da bikarhîneran ser mercên tecrîda kesên wekî metirsîdar diyarbûyî nîqaş bikin. Lijne bi bawer e eger Facebook ser siyasetên xwe zelaltir bibûya ziyana ji vê şaşiyê dikaribû kêm bibe yan bi giştî jê bi dûr bikeve. Hetanî bêyî bi şaşî cîbicîbûna rênîşana siyaseta navxweyî, Lijne têgihîşt naverok diviya qet nehatiba pakkirin. Ew tenê vexwendina bo nîqaşkirina pêwîstiya ragirtina Ocalan li tecrîdê bû û pakkirina wê xizmeta armanca siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar "bo pêşîlêgirtin û qutkirina ziyana dinyaya-rastîn" nekiriye. Li şûnê, ev pakkirin bû sebeba kêmsînorkirina azadiya gotinê ser negîraniyeke mafên mirov.

2. Wesifkirina mijarê

Ev mijar li bara naveroka têkildarî Abdullah Ocalan, endamekî damezirîner ê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), ye. PKK di salên1970yî de bi armanca damezirandina dewleteke serbixwe ya kurd li Başûrê Rojhilatê Tirkiyeyê, Sûriyê û Iraqê hat çêkirin. Ev koma bo gihîştina armanca xwe tundiyê bi kar tîne. DYA, YE, Inglistan, û Tirkiyeyê û hin dewletên din PKK wekî terorîst diyar kirine. Ocalan ji wextê girtin û zîndanîbûna xwe li sala 1999an ve ji ber kirina karên tund bi armanca cudakirina beşek ji axa Tirkiyeyê li Girava Imraliyê zîndanî ye (*Mijara Ocalan hemberî Tirkiyeyê,* Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirov).

Li roja 25 Çileyê 2021, bikarhênerekî Instagramê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wêneyekî Ocalan weşand ku peyvên inglîsî yên bi wateya "hûn gişt bo vê gotûbêjê amade bin" tê de hebûn. Bikarhênerî di binê wêneyê de nivîsî dema wê ye ser bidawîanîna tecrîda Ocalan li zîndana girava Imraliyê biaxivin. Bikarhênerî xwendevan han dan bikevin gotûbêja ser zîndanîbûna Ocalan û rewşa nemirovane ya tecrîdê, jê bi rêya greva birçîbûnê, itiraz,

karên qanûnî, nivsarên rojnamevanî, komên xwendinê, çalakiyên qerfî. Naverokê daxwaza azadbûna Ocalan nekir, yan navê PKKê neanî û piştevaniya tundiyê jî nekir.

Facebookê ev nivîs bi awayê xwebixwe nîşan kir û, piştî ku birêvebirekî nirxand, li roja 12 Sibatê ji ber binpêkirina siyaseta ser Kes û Saziyên Metirsîdar pak bû. Bikarhînerî li vê biryarê itiraz kir û agahdar bû biryar a dawîn e û ji ber kêmbûna demkî ya şiyana venêrînê ya Facebookê bo Kovîd-19 nikare were venêrîn. Lê, birêvebirekî duyem dîsan li naverokê venêrîn kir, wî jî binpêkirina siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdartê de dît. Bikarhînerî agahdarî wergirt ku venêrîna duyem biryara destpêkê wekî xwe hîşt. Piştre bikarhênerî li Lijneya Çavdêriyê itiraz kir.

Lijneyê mijar bo venêrînê hilbijart û ew bo panelekê terxan kir. Ji ber ku Facebookê eqlaniyeta biryara xwe ji Lijneyê re amade kir, wê zanî ku beşeke rênîşana navxweyî ser siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar rê dide nîqaş yan gotûbêjan ser mercên tecrîda kesên wekî metirsîdar diyarbûyî. Ev rênîşan di sala 2017an de û heya astekê wekî bersiv bo negîraniya navneteweyî ser mercên zîndanîbûna Ocalan hat çêkirin. Facebookê şirove kir ku di sala 2018an de rênîşan “bêyî ku were zanîn” bo pergaleke nû ya venêrînê nehatiye veguhestin. Herwiha ew ji koma Facebookê ya siyasetê re nehat biparvekirin ku wan rêzikan amade dike ku çi ser vê platformê destûrdar e. Hevdem ku ev rênîşan ji hêla teknîkî ve ji birêvebirên naverokê re wekî vesereke hînkariyê berdest bû, şîrket qebûl dike li dema rêbazên venêrîna standardê peydakirin dijwar bû û di vê mijarê de ew li berdestê birêvebirî de nebû. Ev rênîşan belgeyeke rijd a navxweyî ye ku bo arîkariya birêvebirên Facebookê çêbûye û di Standardên Civakê yên Facebookê li rûbirûyî gel yan Rêzikên Civakê yên Instagramê de nehatine nîşandan.

Facebookê tenê ji ber vê zanî ev siyaset nedihat bikaranîn ku bikarhînerî biryar da li bal Lijneyê dijî biryara Facebookê bo pakkirina naverokê itiraz bike. Eger ji ber karê vî bikarhînerî nebûya, renge ev şaşiya tu caran nehatiba zelalkirin. Ji 29 Hezîranê ve, Facebook divê siyaseta navxweyî ya ku nebaş cîbicî bûye dîsan bike nava rênîşanên bo birêvebirên naverokê. Şîrketê ji Lijneyê re şirove kir “ew ê kar bike piştrastbe ku rênîşana ku bo venêrînerên xwe yên naverokê ser vê mijarê amade dike zelal be û pirtir berdest be ku arîkar be li pêşerojê de ji pêkhatina şaşiyan bi dûr be.”

Facebookê li roja 23 Nîsanê naverok vegerand Instagramê û Lijne agadar kir ku “ew niha ser birojkirina siyasetên xwe kar dike da ku zelal bike bikarhîner dikarin ser mercên tecrîda kesên wekî terorîst diyarbûyî yan binpêkirinên mafên wan ên mirov nîqaş û gotûbêjan bikin lê hevdem jî pesndan yan piştevaniya ji karên tund ên wan kesan qedexe dike.” Şîrketê pêşwaziya“nêrîn û rênîşana Lijneyê kir ser çawan hevkêşeyekê çêbike nava geşepêdana gotina ser mijarên negîraniya mafên mirov hevdem jî piştrast be platforma wê bo berbelavkirina naveroka pesndan yan piştevaniya ji terorîstan yan kiryarên tund nayê bikaranîn.”

3. Rayedarî û qada wê

Hêza Lijneyê heye li pey itiraza bikarhînerekî ku nivîsa wî hatiye pakkirin biryara Facebookê vebinêre (Madeya 2 ya Fermanê, Beşa 1; Madeya 2 ya Qanûnê, Beşa 2.1). Lijne dikare wê biryarê wekî xwe bihêle yan berovajî bike (Madeya 3 ya Fermanê, Beşa 5). Hevrê digel biryara 2020-004-IG-UA, berovajîkirina biryarekê ku bikarhînerekî dijî wê itiraz kiriye bi wê wateyê nîne ku Facebook nikare mijarê vebinêre.

Biryarên Lijneyê gerekî ne û daxuyaniyên rawêjkariya siyasetê digel tewsiyeyan jî tê de hebin. Ev tewsiye ne-gerekî ne, lê divê Facebook bersiva wan bide (Madeya 3 ya Fermanê, Beşa 4).

Lijne mekanîsmeke serbixwe ya gilîkirinê bo lênêrîna nakokiyan bi şêweyeke zelal û bingehîn e.

4. Standardên têkildar

Lijneya Çavdêriyê di biryara xwe de standardên jêrê berçav girt:

I. Siyasetên Facebookê yên naverokê:

Rêzikên Civakê yên Instagramê dibêjin ku Instagram cihek bo piştevanî yan pesndana terorîsmê, birêxistina cinayetan, yan bêzariya ji koman nîne. Di vê beşa Rêzikan de girêdankeke Standardên Facebookê yên Civakê ser Kes û Saziyên Metirsîdar (guherîneke

parekê ku birojbûna 23 Hezîranê li Standardên Civakê nîşan dide li vir e) heye. Di bersiva pirseke Lijneyê de, Facebookê erê kir ku Standardên Civakê bi heman şêweyê ku bo Facebookê bi kar tên bo Instagramê jî bi kar tên.

Standarda Civakê ya Kes û Saziyên Metirsîdar dibêje ku "em, wekî hewldanekê bo pêşîlêgirtin û qutkirina ziyana dinyaya-rastîn, rê nadin tu sazî yan kesan ku memûriyeteke tund ragihînin yan di tundiyê de destê wan hebe û li ser Facebookê bin." Vê Standardê, di wexta ku pêk hat de, got ku Facebook "wê naverokê pak dike ku piştevanî yan pesndana wan kom, rêber yan kesan dikin ku di van çalakiyan de destê wan heye ."

II. Nirxên Facebookê

Nirxên Facebookê di pêşgotina bo Standardên Civakê de hatine nivîsîn.

Nirxê “Deng” wekî “sertirîn” wesif bûye:

Armanca Standardên me yên Civakê hertim afirandina cihekî bo gotinê û dayîna deng bo gel bûye. […] Em dixwazin gel bikare bi eşkereyî ser pirsgirêkên ku bo wan girîng in biaxive, hetanî eger hin kes digel nebin yan li wan itiraz bikin.

Facebook bo xizmeta çar nirxan “Deng” kêmsînor dike, û yek li vir têkildar e:

“Ewlebûn”: *Em erkdar in Facebookê bikin cihekî ewle. Gotina ku gefan li gelî bixwe potansiyela wê heye kesên din bitirsîne, derxîne yan bêdeng bike û ser Facebookê destûra vêya tuneye.*

III. Standardên mafên mirov:

Bingehên Rênîşandêr ên NY ser Bazirganî û Mafên Mirov (UNGPs), ku Konseya Mafên Mirov a NY li sala 2011an erê kir, çarçoveyeke xwebexş bo berpirsyariyên mafên mirov ên bazirganiyên taybet dadimezirîne. Li Adara 2021, Facebookê bo xwe Siyaseta Mafên Mirov a Şîrketan ragihand, ku tê de dîsan erka xwe bo rêzgirtina mafên mirov li gor UNGPs dubare kir. Lêhûrbûnên Lijneyê di vê mijarê de bi standardên jêrîn ên mafên mirov hat agahdarkirin:

- Azadiya gotinê: Madeya 19, Peymana Navneteweyî ser Mafên Medenî û Ramyarî (ICCPR); Madeya 6, Danezana ser Bergirên Mafên Mirov, A/RES/53/144 (1998); Komîteya Mafên Mirov, Nêrîna Giştî Hejmar. 34 (2011); Raporvanê Taybet ser azadiya bawer û gotinê, A/HRC/38/35 (2018), A/74/486 (2019); Raporvanê Taybet ser mafên mirov û dijî-terorîsmê, A/HRC/40/52 (2019)

- Mafê çareserkirinê: Madeya 2, ICCPR; Komîteya Mafên Mirov, Nêrîna Giştî Hejmar. 31 (2004)

- Qedexeya işkence, reftar yan cezakirinên zalimane, nemirovane yan piçûkkirinê: Rêzika 43, rêzikên Mînîmuma Standarda NY bo Reftarên Zîndaniyan (Rêzikên Nelson Mandela) A/Res/70/175 (2016).

5. Daxuyaniya bikarhînerî

Di itiraza xwe li bal Lijneyê, bikarhînerî şirove kir ku wan naverok weşand da nîqaşa ser felsefeya Ocalan û kutakirina tecrîda wî gurr bikin. Bikarhînerî got ew bi bawer in qedexekirina danûstandina ser Ocalan û felsefeya wî pêşiya wan nîqaşan digire ku dikarin bibin sebeba çareseriya aştiyane bo gelê kurd li Rojhilata Navînê. Wan got jî ku nexwestine tundiyê xurt bikin lê bi bawer in divê ser wêneyê Ocalan ser Instagramê qedexe tunebe. Bikarhînerî idia kir ku têkildarkirina rûyê Ocalan bi saziyên tund re ser bingeha rastiyê nîne, lê pirtir buxtan û hewldaneke berdewam e bo bêdengkirina guftogoyeke girîng. Wan zîndanîbûna Ocalan bi ya Nelson Mandela serokkomarê berê yê Afrîkaya Başûr re hevrû kirin, bi bîr anîn ku civaka navneteweyî di ronîkirina zîndana Ocalan de rola wê heye hema wisan ku bo Mandela kirin.

6. Şiroveya biryara Facebookê

Facebook li destpêkê gihîşt vê encamêku naverok vexwendina bo karê piştevaniya ji Ocalan û PKKê bû, ku siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar binpê kiriye. Ocalan bi kesên din re PKK damezirand, ku Facebook dibêje Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wekî Saziyeke Terorîst a Biyanî diyar kiriye. Ser bingeha vê diyarkirina saziyê, Facebookê Ocalan li rêzeya kesên wekî

metirsîdar diyarbûyî zêde kir. Li gor siyaseta xwe ya Kes û Saziyên Metirsîdar, Facebook hemû naverokên ku wekî pîştevaniya kesên metirsîdar xuya dikin pak dike.

Piştî ku Lijneyê ev mijar bo venêrînê hilbijart, Facebookê naverok dîsan dijî siyasetên xwe nirxand û têgihîşt ku li sala 2017an de di vî warî de rênîşana navxweyî çêkiriye. Di şirovekirina rewşê de, Facebookê got ku bêyî ku bizane nikariye vê rênîşanê veguheze wexta ku ket pergaleke nû ya venêrînê li sala 2018an û li seranserê koma xwe ya siyasetê bi par ve nekir.

Ev rênîşana wê derê rê dide naverokê ku nivîs wê demê bo azadiya terorîstekî vedixwîne ku paşxaneya naverokê bi awayekî bi par ve bibe ku alîgiriya aştiyê yan nîqaşa ser zîndanîbûna kesê terorîst bike. Bi bikaranîna wê rênîşanê, Facebookê zanî naveroka vê mijarê însafen dikeve wê çarçoveyê û naverok vegerand.

7. Nêrînên kesê sêyem

Lijneyê 12 nêrînên eşkere têkildarî vê mijarê wergirt. Şeş ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Kanadayê, çar ji Ewropayê, û dudu ji Rojhilata Navînê û Bakûrê Afrîkayê hatin.

Nêrîn ser mijarên wekî nebûna zelalbûna ser siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar herwiha dijbûna wê digel qanûna mafên mirov de bûn, û ew vexwendina bo nîqaşa ser tecrîdê pesndan yan pîştevaniyê çênake.

Bo xwendina nêrînên eşkere yên ser vê mijarê wergirtî pêl bikin vir.

8. Lêhûrbûna Lijneya Çavdêriyê

8.1 Pêkanîna siyasetên Facebookê yên naverokê

Lijne têgihîşt ku biryara Facebookê bo pakkirina naverokê hevrê digel Standardên şîrketê yên Civakê nebû. Standarda Civakê ser Kes û Saziyên Metirsîdar heya ew roja 23 Hezîrana

2021 biroj bû rave nekiriye “pişтevaniya” ji kesekî yan saziyeke wekî metirsîdar diyarbûyî çi ye.

Li Çileyê 2021, Lijneyê tewsiye kir ku Facebook bi eşkereyî pesndan, pişтevanî û nûnertiyê rave bike herwiha mînakên zelaltir ser çawan bikarhatina siyasetê amade bike (mijar 2020-005-FB-UA). Li Sibatê, Facebookê xwe erkdar kir “ziman li Standarda Civaka me ya Kes û Saziyên Metirsîdar di nava çend hefteyan de zêde bike û şirove bike eger naverok zelal nebe mimkin e em wê pak bikin [herwiha] raveyên “pesndan,” “pişтevanî” û “nûnertiyê” di nava çend mehan de lê zêde bike.” Li 23 Hezîrana 2021, Facebookê ev standard biroj kir ku raveyan têxe nav. Lijneyê tewsiye jî kir ku Facebook pêwendiyên nava Rêzikên Civakê yên Instagramê û Standardên Civakê yên Facebookê (mijar 2020-004-IG-UA) zelal bike. Ji roja 29 Hezîranê ve, Facebook divê Lijneyê ji karê xwe bo pêkanîna vê erkdariyê agahdar bike.

Di mijara niha de, li pey daxwazeke ji Lijneyê, Facebookê rênîşana navxweyî bo birêvebirên naverokê ser wateya “pişтevaniya” ji kes û saziyên metirsîdar bi par ve bike. Ew “vexwendina bo karê pişтevaniyê” wekî vexwendina rasterêkirina berbêjan bo kirina karekî rave dike ku saziyeke wekî metirsîdar diyarbûyî yan pirsa wê zêdetir bike. Di dema ku ev naverok hat weşandin ev ziman di Standardên Civakê yên bo gel-eşkere de nehatiye nîşandan û di birojbûna li 23 Hezîranê 2021 weşandî de jî tuneye.

Ji bilî vêya, rênîşana nebaş cîbicîbûyî û ne-eşkere bo gel ku li 2017an de wekî bersiv bo tecrîda Ocalan çêbû zelal dike ku nîqaşên ser mercên zîndana kesê wekî metirsîdar diyarbûyî destûrdar e û pişтevanî nayê hesêb. Di nebûna her cure paşxaneya din de, Facebook daxuyaniyên vexwendina azadiya terorîstekî wekî pişтevanî dibîne û naverokeke wisan tê pakkirin. Dîsan, ev ziman di Standardên Civakê yên bo-gel eşkere de nehatiye nîşandan.

Lijne negîran e ku rênîşana taybet bo birêvebiriyê ser awarteyeke girîng a siyasetê bi qasî sê salan ji dest çûye. Ev rênîşan zelal dike ku naveroka vê mijarê binpêkirin nebû. Eger Lijneyê ev mijar bo venêrînê hilnebijartiba, rênîşan ê bo birêvebirên naverokê re nenas bima, û qaseke berbiçav a gotina li berjewendiya gel dê bihatiba pakkirin.

Ev mijar diselimîne çima rêzikên eşkere bo bikarhîneran girîng in: ne tenê wan ji çi bendewar e agahdar dikin, lêbelê wan xurt jî dikin şaşiyên Facebookê amaje bikin. Lijne bo weşandina hemû rêzikên birêvebiriya naverokê ji ber negîraniyên ser hin bikarhîneran ku ji vêya mifa werdigirin bo naveroka ziyandar berbelav bikin sipasiya Facebookê dike. Lê, siyaseta Facebookê ya qisûra pakkirina naveroka nîşandêra "piştevaniya" ji kesên diyarbûyî, hevdem ku awarteyên kilîdî ji gel veşartî dihêle, rê da şîrket bi qasî nêzîkî sê salan bêyîberpirsyarî vê şaşiyê nebîne. Birojbûna Hezîrana 2021 li Standardên Civakê yên Kes û Saziyên Metirsîdar zanyariyên pirtir amade dike ser tiştê ku Facebook wekî "piştevanî" dihesibîne lê ji bikarhîneran re şirove nake çi awarte dikarin li van rêzikan werin bikaranîn.

Hetanî bêyî peydakirina rênîşana nebaş cîbicîbûyî, naverok diviya bo "piştevaniyê" nehatiba pakkirin. Ev cure vexwendina bo karekî divê wekî piştevaniya ji armancên metirsîdar ên PKKê neyên fêmkirin. Bikarhîner tenê gel handa ser tecrîda Ocalan, jê bi rêya greva birçîbûnê, itiraz, karên qanûnî, nivsarên rojnamevanî, komên xwendinê, çalakiyên qerfî nîqaş bikin. Ser vê bingehê, pakkirina naverokê di vê mijarê de li berjewendiya siyaseta ragihandî ya pêşîlêgirtin û qutkirina ziyana dinyaya-rastîn nîne.

8.2. Pêkanîna nirxên Facebookê

Lijne têgihîşt ku biryara Facebookê bo pakkirina vê naverokê bi nirxên Facebookê yên "Deng" û "Ewlebûnê" re li hev nake.

Bikarhînerî nivîsa xwe ya vexwendina nîqaşa ser kutakirina tecrîda Ocalan li Girava Imraliyê bi pisporî amade kiribû. Wan xwendevan han dan ser rewşa nemirovane ya tecrîdê, û çima pêwîst e Ocalan bi awayekî wisan zîndanî be nîqaş bikin. Bikarhînerî alîgiriya karên aştiyane bo handana vê nîqaşê kir, û alîgirî yan handana tundiyê di nivîsa xwe de nekir. Wan piştevaniya bîrdoza Ocalan yan PKKê jî neanî ziman.

Lijne têgihîşt têgeha ku binpêkirina mafên mirov dixe ber xebatê bo nirxê "Deng" xaleke navendî ye. Ev bi taybet bi lêvegra mafên kesên binçavbûyî girîng e, ku renge nikaribin bi awayê kêrhatî li piştevaniya mafên xwe de piştevaniyê bikin, bi taybet li welatên bi bedreftariya idiayî li zîndaniyan ku alîgiriya mafên mirov lê serkut dibe.

Nirxê xaleke “Ewlebûnê” bi awayê têgihîştinî lê bar bû ji ber ku naverok têkildarî kesekî diyarbûyî bû. Lê, pakkirina naverokê tu negîraniya zelal a “Ewlebûnê” nehewand. Di naverokê de ew ziman tunebû ku bikaranîna tundiyê hand bide yan alîgiriya wê bike. Tê de potansiyêla “tirsandin, derxistin, yan bêdengkirina bikarhînerên din” tunebû. Li şûnê, biryara Facebookê bi awayê nerewa dengê kesekî serkut kir ku negîraniyeke mafên mirov anî holê.

8.3. Pêkanîna berpirsyariyên Facebookê yên mafên mirov

Pakkirina vê naverokê bi erkdariya şîrketê re bo rêzgirtina mafên mirov li hev nake ku li Siyaseta Şîrketê ya Mafên Miorv de heye. Têkildarî naveroka terorîstî, Facebook wajokareke Vexwendina Christchurch e, ku armanca wê “rakirina” berbelavbûna “naveroka terorîstî û zêdegaviyê” bi online e. Hevdem ku Lijne ji negîraniyên mafên mirov ku civaka medenî tîne holê ser Vexwendina Christchurch agahdar e, dîsan jî şîrketên torrên civakî gerekdar dike standardên xwe yên civakê "bi awayê lihevkirî digel mafên mirov û azadiyên bingehîn" pêk bîne.

I. Azadiya gotinê (Madeya 19 ICCPR)

Madeya 19 dibêje ku her kes mafê xwe yê azadiya gotinê heye, ku azadiya lêgerîn, wergirtin û biparvekirina zanyariyan tê de hene. Di mafê azadiya gotinê de nîqaşa mafên mirov heye (Nêrîna Giştî 34, benda. 11) û 1) û “mercekî pêwîst e bo pêkanîna bingehên zelabûna berpirsyariyê” (Nêrîna Giştî 34, benda. 3). Herwiha, Danezana NY ser Bergirên Mafên Mirov amade dike ku mafê her kesî heye “ser hemû azadiyên mafên mirov û bingehîn, hem li qanûnê hem li pratîkê, bi rêya van amûran û yên din ên guncaw bixwîne, nîqaş bike, nêrînan çêbike û bi bawer be bo ku bala giştî ber bi wan mijaran ve bikişîne” (A/RES/53/144, Madeya 6(c)).

Bikarhîner hewl daye negîraniyên ser tecrîda kesane û zîndana dirêjbûyî berbiçav bike. Lijne bi bîr tîne ku dezgehên navneteweyî ser karên wisan negîraniyên xwe anîne ziman. Rêzikên Nelson Mandela diyar kirine ku dewlet gerek zîndana tecrîda bêdawî herwiha dirêjbûyî wekî teşeyeke işkence, reftara zalimane yan piçûkkirinê ya cezakirinê qedexe bikin (A/Res/70/175, Rêzika 43). Nîqaşkirina mercên binçavkirina her kesî û binpêkirina idiayî ya

mafên mirov li zîndanê de bi guncawî dikeve nava cureyên gotina parastî li gor madeya 19 ya ICCPR, ku Danezana NY ser Bergirên Mafên Mirov dupat dike ku bo parastina wê hewl dide.

Hevdem ku mafê azadiya gotinê bingehîn e, lê ew mutlaq nîne. Ew mimkin e kêmsînor bibe, lê divê kêmsînorî li gor pêdiviyên qanûnîbûn, armanca rewa, û pêwîstî û anegorîbûnê bin (Madeya 19, benda. 3, ICCPR). Komîteya Mafên Mirov gotiye ku kêmsînoriyên ser gotinê gerek "mafê bixwe neke metirsiyê" û dupat kiriye ku "pêwendiyên nava maf û kêmsînorbûnê û nava asayîtiyê û awarteyê berovajî nebe" (Nêrîna Giştî Hejmar 34, benda. 21). Raporvanê Taybet ê NY ser azadiya gotinê dupat kiriye ku şîrketên torên civakî gerek hewl bidin siyasetên xwe yên birêvebiriyên ser Kes û Saziyên Metirsîdar bi van bingehan re hevrê bikin (A/74/486, benda. 58(b)).

a. Qanûnîbûn (zelalbûn û berdestbûna rêzikan)

Kêmsînoriyên ser gotinê gerek bi baldariya têr û bes terxan bibin wisan ku kes fêm bikin çi qedexeye û li gor wê tevbigerin (Nêrîna Giştî 34, benda. 25). Rêzikên wiha gerek bo gel berdest bin. Rêzikên baldar bo kesên wan pêk tînin girîng in: bo kêmkirina şiyanê û pêşîlêgirtina biryardana xweserane, û herwiha ewle parastina dijî alîgiriyê.

Lijneyê tewsiye kir li mijara 2020-005-FB-UA ku Standarda Civakê ser Kes û Saziyên Metirsîdar sererast bibe û ," "pesndan," û "piştevanî," rave bibin û ev negîranî li case 2021-003-FB-UA dubare kirin. Lijne bi bîr tîne ku Facebookê niha bi eşkereyî ew têgeh rave kirine. Raporvanê Taybet ê NY ser azadiya gotinê qedexeyên platformên torrên civakî ser "pesndan" û "piştevaniyê" wekî "gelekî nediyar" wesif kiriye (A/HRC/38/35, benda. 26; herwiha binêrin li: Nêrîna Giştî Hejmar 34, benda. 46). Di nêrîneke giştî de ku Lijneyê wergirt (PC-10055), Raporvanê Taybet ê NY ser mafên mirov û dijî-terorîsmê bi bîr aniye ku tevî ku Facebookê hin pêşketin kirine rêzikên xwe di vî warî de zelal bike, lê "Rênîşan û Standard [hîn] jî bi qasî ne têr û bes bi hiqûqa navneteweyî re li hev nakin û dikarin di pratîkê de bo kêmkirina hin mafên bingehîn kar dikin, jê lê ne tenê azadiya gotinê, encumenê, beşdarbûna li karbarên giştî û ne-cudakariyê." Çendîn nêrînên giştî nirxandinên wekî vêya kirin.

Lijneyê bi bîr anî Facebook rênîşana berfireh û nihênî bo venêrînerên xwe re amade bike da ku siyasetên şîrketê yên naveroka bo-gel eşkere tefsîr bikin, ji birêvebiriya lihevkirî û ne-xweserane piştrast bin. Lê, pejiranbar nîne ku rêzikên kilîdî ser tiştê ku ji raveya Facebookê ji piştevaniyê derve ye di Standardên Civakê yên bo-gel eşkere de nayên nîşandan.

b. Armanca rewa

Kêmsînoriyên ser azadiya gotinê gerek amanceke rewa bişopîne. ICCPR armancên rewa li Madeya 19, benda. 3 rêze dike, ku parastina mafên kesên din tê de heye. Lijne bi bîr tîne ku ji ber ku Facebookê piştî itiraza bikarhînerî biryar berojavî kir, li pey ku Lijneyê ew itiraz hilbijart, şîrketê hewl neda pakkirinê wekî şopandina armanceke rewa ragihîne lê li şûna wê pakkirin wekî şaşî bi nav kir.

Standardên Civakê şirove dikin ku siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar hewl dide pêşiya ziyana dinyaya rastîn bigire û qutbike. Facebookê berê ji Lijneyê re ragihandiye ev siyaset gotina bo parastina “mafên kesên din” kêmsînor dike, ku Lijneyê pejirandiye (mijara 2020-005-FB-UA).

c. Pêwîstî û anegorîbûn

Kêmsînoriyên ser azadiya gotinê bo gihîştina armanceke rewa gerek pêwîst û anegorî bin. Ev erkdar dike nava gotinê û gefeke bi zelalî nasbûyî de pêwendiyeke rasterast hebe (Nêrîna Giştî 34, benda. 35), û kêmsînorî “divê amûra herî kêm astengbar ji nava wan be ku bikare karê wan ê parastinê bi dest bîne” (Nêrîna Giştî 34, benda. 34).

Her wekî ku Facebookê bi berovajîkirina biryara xwe û piştî ku Lijneyê ev mijar hilbijart bi awayê sergirtî itiraf kir, pakkirina vê naverokê pêwîst û anegorî nebû. Bi bawera Lijneyê, pehnahiya têgeha “piştevaniyê” li Standardên Civakê de digel nebaş cîbicîbûna rênîşana navxweyî ser tiştê ku vêya derdixe, yanê pakkirineke nepêwîst û neanegorî rûdaye. Naveroka vê mijarê bo nîqaşa ser kutakirina tecrîda Ocalan li zîndana dirêjbûyî û tenê vedixwend. Ew ser Ocalan wekî kes axivî û tu piştevanî ji karên tund ên ku wî yan PKKê kirine nîşan neda. Tu mebsta selimanbar ya handana tundiyê yan ihtimal tunebû ku ev daxuyanî yan ên din wekî wê ser platformê dê bibin sebeba ziyanê.

Lijne bi taybet ser pakkirina naveroka mijarên li berjewedniya gel bi destê Facebookê li wan welatan negîran e ku paraastinên neteweyî yên qanûnî û dezgehî bo mafên mirov bi taybet azadiya gotinê lawaz in (mijarên 2021-005-FB-UA û 2021-004-FB-UA). Lijne negîraniya vegotî li aliyê Raporvanê Taybet ê NY ser mafên mirov û dijî-terorîsmê li nivîsên wê de bi par ve dike, ku "paraastina nebaş a mafên mirov ser platformê [...] dikare gelekî zêde ji hêla parastina cîhanî ya hin mafan ve, kêmberkirina qasa medenî, û xurtkirina neyînî ya pêvajoyan ser desthilatê, berpirsyarî û serdestbûna qanûnê li gelek dezgehên neteweyî bi dûhat be." Lijne bi bîr tîne ku Raporvanê Taybet ê NY ser azadiya gotinê negîraniyên taybet li vî warî de li bara Tirkiyeyê aniye ziman (A/HRC/41/35/ADD.2).

II. Mafê çareserkirinê (Madeya 2 ICCPR)

Mafê çareserkirinê pêkhateyeke kilîdî ya qanûna navneteweyî ya mafên mirov e (Nêrîna Giştî Hejmar. 31) û stûna sêyem a Bingehên Rênîşandêr ên NY ser Bazirganî û Mafên Miorv e.. Raporvanê Taybet ê NY ser azadiya gotinê aniye ziman ku pêvajoya çareseriyê "gerek tê de pêvajoyeke zelal û berdest bo itiraza li biryarên platformê hebe, şîrket jî bersiveke bi delîl û hokar bidin ku divê bo her kesî jî berdest be" (A/74/486, benda 53).

Di vê mijarê de, bikarhîner agahdar bû ku ji ber Kovîd-19 itiraz mimkin nebû. Lê, piştre itiraz hat kirin. Lijne careke din ser pêdiviyê radiweste ku Facebook pêvajoya itirazan hevrê digel tewsiyeyên mijarên 2020-004-IG-UA û 2021-003-FB-UA. bike.

Hevdem ku bikarhînerê vê mijarê naveroka xwe da vegerandin, Lijne ji tiştê ku dikare hemjareke mezin a pakkirinan be negîran e ku diviya rûnedabana ji ber ku Facebookê rênîşana xwe ya navxweyî ji dest dabû ku rê dida nîqaşa ser mercên tecrîda kesên diyarbûyî. Facebookê Lijne agahdar kir ku ser vêya venêrînê dike ku çawan nikariye vê rênîşanê bo pergala xwe ya nû ya venêrînê veguheze, herwiha gelo siyasetên din jî ji dest çûne yan na. Lê, şîrketê di bersiva bo pirsa Lijneyê de got ku "ji hêla teknîkî ve mimkin nîne diyar bibe çend naverok pak bûne dema ku ev rênîşana siyasetê bo venêrîneran berdest nebû."

Lijne negîran e ku raporkirina Facebookê ya zelalkirinê bo nirxandina watedar bes nake eger cureya şaşiya peydabûyî di vê mijarê de pirsgirêkeke pergalî nîşan bide. Di pirsên ku dane

Facebookê de, Lijneyê zanyariyên pirtir ser qasa şaşiyên wê bo pêkanîna rêzikên ser “pesndan” û “piştevaniya” ji kes û saziyên metirsîdar daxwaz kir. Facebookê şirove kir ew di asta rêzikên kesane di nava siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar de, yan têkildarî pêkanîna awarteyên taybet ku tenê di rênîşana navxweyî de hene qasa şaşiyan berhev nake. Facebookê bo Lijneyê îşareyî zanyariyên berdestê hemûyan ser qasa naveroka vegerandî kir ku piştî bi awayê nedurist ji ber binpêkirina siyaseta wê ser Kes û Saziyên Metirsîdar pak bûbûn. Lijne bi bîr tîne ev heman cureyê hûrgiliyan amade nake ku di lênêrînên navxweyî û kontrola çawaniyê de bo nirxandina baldariya pêkanînê were nîşandan. Hevdem ku Facebook itiraf dike ew bi awayê navxweyî qasa şaşiyan bo biryarên pêkanînê bi destê birêvebiran yan bi awayê xwebixwe dişikêne, lê ser vê bingehê ew zanyarî nedan Lineyê ku “ev zanyarî bi awayê maqûl li gor mebesta Fermanê bo biryardanê gerek nîne.”

Herwiha, Lijneyê ji Facebookê pirsî gelo eger naverok bo binpêkirina Standardên Civakê û li pey nîşanbûna naverokê ji aliyê dewletê ve pak bûbe itirazbar e yan na. Facebookê erê kir mijarên wisan bo Lijneyê itirazbar in. Ev ji wan ên ku ser bingeha daxwaza dewletê pak bûne ku li gor qanûna xwecihî bin cuda ye, ku li gor Madeya 2, Beşa 1.2 ya Destûran ji venêrînê hatine derxistin. Hevdem ku Lijne tu delîlê nabîne bawer bike ev naverok mijara lêvegera dewletekê bû, negîran e ne bikarhînerê ku naveroka wî ser bingeha Standardên Civakê pak bûye, ne jî Lijne, neyên agahdarkirin li ku dewletê bo pakkirina naverokê destwerdan kiriye. Ev dikare bi taybet bo biryarên pêkanînê berbiçav bin ku piştre wekî şaşî tên naskirin, herwiha li cihê ku bikarhîner guman dikin dewletê destwerdan kiriye lê wisan nebûye. Raporkirina Facebookê ya zelalkirinê jî di vê hêlê de kêmsînor e. Hevdem ku tê de amarên ser daxwazên qanûnî yên dewletan bo pakkirina naverokê ser bingeha qanûna xwecihî heye, tê de daneyên ser naveroka ku ji ber binpêkirina Standardên Civakê bi nîşankirina dewletê pak bûne tuneye.

Ev koma negîraniyan nîşan dide Facebook nikare mafê çareserkirinê, dijî Siyaseta Şîrketê ya Mafên Mirov (Beşa 3) raçav bike.

9. Biryara Lijneya Çavdêriyê

Lijneya Çavdêriyê biryara sereke ya Facebookê betal kir ku naverok rakiribû, erkdar kir nivîs were vegerandin. Lijne bi bîr tîne ku Facebookê pejirandiye ku biryara wê ya sereke nedurist bû û berê nivîs vegerandiye.

10. Daxuyaniya rawêjkariya siyasetê

Wekî jorê hat gotin, Facebookê Standardên xwe yên Civakê ser Kes û Saziyên Metirsîdar piştî wê guhert ku ji Lijneyê daxwaz kir ser çawan ev Standardên Civakê dikarin kar bikin rênîşanê amade bike. Ev tewsiye di birojbûnên Facebookê de tên hesêb.

Rênîşana nebaş cîbicîbûyî ya navxweyî

Heya ku guherînên pirtir li siyaseta bo gel-eşkere ya Kes û Saziyên Metirsîdar çêbibin, Lijne li Facebookê tewsiye dike gerek kiryarên jêrê yên demkî bike ku pêkanîna şaşîdar a siyaseta heyî kêm bike:

1. Demildest rênîşana nebaş cîbicîbûyî ya sala 2017an bo Standardên Pêkanîna Navxweyî û Pirsên Naskirî (rênîşana navxweyî bo birêvebiran) vegerîne, hemû birêvebirên naverokê agahdar bike ku ew heye û hînkariya ser wê demildest bike.

2. Pêvajoya birêvebiriya xwebixwe bo pêkanîna siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar binirxîne û her dera pêwîst be destebendîkaran biroj bike ku daneyên hînkariyê beriya pêkanîna wan şaşiyan derxîne ku ji qisûra bikaranîna rênîşana 2017an çêbûne. Daneyên nû yên hînkariyê gerek lê zêde bibin ku vegerandina vê rênîşanê nîşan bidin.

3. Encamên pêvajoya venêrîna niha biweşîne ku diyar bibe gelo siyasetên din ji dest çûne yan na, jê wesifkirina hemû siyasetên jidestçûyî, serdema ku ew siyaset ji dest çûne, û gavên hatine avêtin wan vegerînin.

Birojkirina li siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar

Facebookê Lijne agahdar kir ku niha ser birojkirina siyasetên xwe kar dike da zelal bike rêzikên wê ser “pesndan” û “piştevaniyê” nîqaşên ser mercên zîndana kesên diyarbûyî yan binpêkiirnên din ên mafên wan ên mirov qedexe nake.

Wekî arîkariyeke destpêkê bo vê pêvajoya çêkirina siyasetê, Lijneyê tewsiye kir ku Facebook gerek:

4. Di “eqlaniyeta siyaseta” Kes û Saziyên Metirsîdar de rêzgirtina mafên mirov û azadiya gotinê, bi taybet nîqaşa vekirî ser binpêkirinên mafên mirov û destdirêjiyên ku têkildarî terorîsmê û hewldana rawestana dijî terorîsmê ne were nîşandan, dikare nirxê “Ewlebûnê” bi pêş ve bibe, û ew bo platformê girîng e meydanekê bo van nîqaşan amade bike. Hevdem ku “Ewlebûn” û “Deng” dikarin carinan di aloziyê de bin, eqlaniyeta siyasetê gerek bi hûrgiliyên berfirehtir wan “ziyanên dinyaya-rastîn” terxan bikin ku siyaset hewl dide dema serkutbûna “Deng” de pêşiyê bigire û qut bike.

5. Şiroveyeke zelal ya çi derveyî “piştevaniyê” ye li siyaseta Kes û Saziyên Metirsîdar zêde bike. Bikarhîner gerek azad bin binpêkirinên idiayî û destdirêjiyên mafên mirov ên endamên saziyên diyarbûyî nîqaş bikin. Ev gerek kêmsînorî kesên binçavbûyî nebe. Gerek tê de nîqaşa mafên parastî li gor konvansiyonên NY yên mafên mirov hebin wekî Siyaseta Şîrketê ya Mafên Mirov a Facebookê gotiye. Ev gerek, wek mînak, rê bide nîqaşên ser idiayên işkence yan reftara zalimane, nemirovane yan piçûkkirinê yan cezakirinê, binpêkirinên mafê dadgeheke dadwerane, herwiha bidarvekirinên derqanûnî, kurt yan xweserane, windakirina bi zorê, paşvegerandina derqanûnî û betalkirina welatîbûnê ku kesek bê welatîbûn bibe. Vexwendinên bo berpirsyariya binpêkirinên mafên mirov û destdirêjiyan jîgerek werin parastin. Naveroka ku karên tundiyê yan endamkirina gel han bide yan bi awayekî din piştevaniya madî bo saziyên Facebookê diyar kiriye gerek i parastinê derve bin hetanî eger heman naverok jî nîqaşa negîraniyên mafên mirov bike. Mebesta bikarhînerî, paşxaneya berfirehtir ku tê de diweşînin, û çawan bikarhînerên din nivîsên wan fêm dikin, bo diyarkirina ihtimala ziyana dinyaya-rastîn ku dikare ji nivîsên wisan çêbibe xaleke kilîdî ye.

6. Di Standardên Civakê de şirove bike çawan bikarhîner dikarin li pişt nivîsên xwe mebesta xwe ji Facebookê re zelal bikin. Pêkanîna tewsiyeya heyî ya Lijneyê bo eşkerekirina vekirî ya rêzeya kes û saziyên diyarbûyî dê arîkariyê bide vêya (binêrin li: mijara 2020-005-FB-UA). Facebook gerek mînakên şiroveyî jî amade bike da ku xeta nava naveroka destûrdar û qedexe zelal bike, jê têkildarî bikaranîna rêzika ku ronî dike çi derveyî "pişteva niyê" ye.

7. Bi rêya Foruma Siyaseta Berhemê ya Facebookê tevlêbûna watedar a pardaran ser guherîna pêşniyarî ya siyasetê, jê bi rêya vexwendina eşkere bo danînan piştrast bike. Facebook gerek vê tevlêbûnê bi çendîn zimanan li navçeyan bike, beşdariya kêrhatî ya wan kesan piştrast bike ku pirtir ketine bin bandora wan ziyanan ku ev siyaseta hewl dide pêşiyê lê bigire. Ev tevlêbûn gerek tê de mafên mirov, civaka medenî, û saziyên akademîk bi zanebûna pisporane ser wan ziyanan, herwiha ziyaanên ku dikarin ji zêde-pêkanîna siyaseta heyî çêbibin, hebin.

8. Piştrast bike rênîşana navxweyî û hînkarî bo birêvebirên naverokê ser her siyaseta nû heye. Gerek bo birêvebirên naverokê çavkaniyên guncaw amade bibin ku bikarin siyaseta nû fêm bikin, û dema guncaw hebe bikarin di wextê pêkanîna siyasetê de biryar bidin.

Pêvajoya pêwîst

Bo pêvajjoya pêwîst bo bikarhînerên ku naveroka wan pak bûye xurt bibe, Facebook gerek:

9. Piştrast be wexta naverok tê pakkirin bikarhîner tên agahdarkirin. Agahdarkirin gerek bibêje gelo pakkirin ji ber daxwaza dewletekê bûye yan ji ber binpêkirina Standardên Civakê yan ji ber dewletekê ku idia kiirye qanûneke neteweyî binpê bûye (û gihîştina dadweriyê ya her pakkirinê).

10. Ji bikarhînerên Instagramê re zelal bike ku Standardên Civakê bi heman şêweyê ku bo Facebookê bi kar tên bo Instagramê jî bi kar tên, ku hevrê digel tewsiyeyên li mijara 2020-004-IG-UAye.

Bo zêdekirina têgihîştina hemûyan ji vêya ku siyaseta veguherî çiqasî kêrhatî tên pêkanîn, Facebook gerek:

11. Zanyariyên ser hejmara daxwazên ku Facebook bo pakkirina naverokê ji dewletan werdigire ku ser bingeha binpêkirinên Standardên Civakê ne (wekî dijî binpêkirinên qanûna neteweyî), û encama wan daxwazan tê de hebin.

12. Zanyariyên giştalîtir ser qasa şaşiyên bo pêkanîna rêzikên ser “pesndan” û “piştevaniya” ji kes û saziyên metirsîdar, ku li gor navçe û ziman şikandibe, tê de hebin.

***Têbîniya rêbazê:**

Biryara Lijneya Çavdêriyê ji aliyê panelên pênc endaman ve amade dibe û piraniya Lijneyê erê dike. Biryar bi awayê pêdivî nêrîna kesane ya hemû endaman raber nake.

Bo vê biryara mijarê, lêkolîna serbixwe ji aliyê Lijneyê ve dan kirin. Enstîtuyeke serbixwe ya lêkolînê li Zanîngeha Gothenburgê û mifa wergirtina ji komeke bêtirî 50 zanyariyên civakî li şeş parzemînan, herwiha bêtirî 3,200 pisporên welatan li seranserî dinyayê, ser paşxaneya civakî-ramyarî û çandî xalên pisporî amade kirin.